

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



Dîdara Têmûr 4 salî



ZAROK FÊKIYÊN MALAN E

Hejmaran bigihînê hev



D I N Y A

Berî bi milyonan sal
di valatiya asîman de
ewrekî gaza germ hebû.
Ev ewrê han di valati-
ya asîman de difitilî.
Çaxa gaz û tozên di na-
va vî ewrî de dieciqîn
germbûna wan zêdetir



dibû û rê ji tegandinan re vedikir.

Di dongiya(netîca)van tegandinan de
ji wan ewrên toz û gazê stêrkek bi-
riqandî afirî(çê bû).Ew stêrk"RO"ya
ku,îro ronahiyê dide me,ye.Ji eciqî-
na ewrên toz û gazê hin tiştên din
di valatiya asîman(ezman)de afirîn.
Ji wan yek jî"dinya"ye.

Dinya,ku ji ewrên toz û gazê afiri-
ye,piştî wextekî dûr û dirêj sar bû.
(cemidî)Her ku dinya cemidî piçûk bû
û kete rengê gokeke(topeke)girover.
Aliyê der ji aliyê hundur zûtir ce-
midî.Ji vê yekê aliyê der qaşil girt
lê aliyê hundur germ ma.Îro li gelek
ciyan ava germ ji binê erdê derdikeve
ev jî diaşkirîne(îspat dike) ku binê
erdê hê germ e.

Piştî ku ruwê erdê(dinê) cemidî, kortalên kûr û gir(tim)pêk hatin. Her ku baran dibariya ev kortalên kûr tijî av dibûn. Derya(behr) û golên piçûk û mezin bi vî awayî pêk hatin. Ji aliyê din jî ciyên ku, gir lê hebûn, teht û lat her ku diçûn piçûk dibûn û di nava demê de ew bûn "ax"

Dinya, ji çara sisê $3/4$ av û ji çara yek jî $1/4$ bejî ye. Piştî sal û zemanan li ser ruwê dinê teba çêbûn. Berê (pêşî) şînayî, paşê heywan(lawir) û paştir jî meriv(mirov-însan) hatin meydana.


x x x x x x x x x x



Hewa, ji gazên ku, dinya me dorpêç kirine, pêk hatiye. Tiştê ku meriv jîndar dike hewa ye. Şînayî heywan û însan bi saya hewayê dijîn. Însan û heywan ji nava hewayê gaza "oksîjenê" distînin û gaza "karbondîoksîtê" derdixin (berdidin) der. Lê şînayî (her tiştê ku hêşin) bi roj gaza "karbondîoksîtê" ya di nava hewayê de distînin û gaza "oksîjenê" ya paqij didin der. Ji ber ku li dora heyvê (hîvê) tebaqa hewa tune, tiştên bi can nikarin li wir bijîn. Oksîjen ku, gazek ji gazên ku hewayê tînin meydanê, ye, ji bo tiştên bi can gelekî girîng e. Çaxa di mezelekê (odakê) de oksîjen kêm be, hewa di odê de zîyanê (xîsarê) dighîne meriv û ew hewa paqijîya xwe wenda dike.

Erda ku em li ser dijîn bi tebaqa hewayê dorpêç kirî ye. Hewa parçek ji dinê û ji jîyanê ye.





HEYV (HÎV)

Hîv, pîrika dinyayê ye. Cismekî piçûk e û li dora dinê difitile. Her cismek mezin xwedî pîrika xwe ye. Ew hem li dora cisman difitilin û hem jî li dora ro yê difitilin.

Hîv, bi tîrêjên xwe nikare weke royê dinyayê ronahî bike. Ronahiya ku, hîv dide dinê, ne ronahiya wê bi xwe ye. Ronahiya hîvê bi alîkariya rîrêjên royê pêk tê. Tîrêjên royê li hîvê dikevin û hîv bi wan tîrêjan ronî dibe. Ronahiya hîvê bi xwe nîne. Ji ber ku em pir dûr in tîrêjên royê, ku li hîvê dikevin, bi awayê ronahiya hîvê ji me re dixuye. Hîv, li dora dinê difitile (gera xwe dike). Çaxa vê fitlê dike, dûriya navbera wê û dinê nayê guhertin. Dinya pêncî (50) gatî hîvê ye, ano, pêncî carî ji hîvê mezin-tir e. Hîv, gera xwe ya li dora dinê di mehekê de temam dike. Di navbera vê ger û fitlê de em heyvê bi awayên cûrbecûr dibînin. Carna zirav e, carna stûr e, carna nîvgirover û carna jî bi temamî girover dibe.

ASÎMAN (EZMAN)

Bi roj asîman gelek caran reng diguherîne. Di havînê de bi piranî renekî şîn digire ser xwe, Lê di zivistanê de geh şîrikî û geh jî reng tarî dibe. Bi şev rengê asîman cuda ye. Havîna asîman bi stêrkên biriqandî dixemile. Çaxa meriv baş bala xwe didê, stêrkên cûrbecûr derdikevin ber çavên meriv, Stêrkin ji wan dimeşin û bêyî ku li hinekadin kevin, berdewamî riya xwe dikin. Gelek caran komek stêrkên xwe li hevdû civandî dikevin ber çavên meriv. Qederê şeş heftekin, Em ji wan re dibêjin "Komka sêwya".


Çaxa دنیا li dora xwe difitile, aliyekî wê royê nabîne. Li ciyê ku ro tîrêjên xwe bernade ser "şev" e, Di asîman de stêrkên pir biriqandî û yên hindik biriqandî hene. Ewên ku pir dibiriqînin "ro" ne, Ew ro ji me pir dûr in. Ewên ku hindikî dibiriqînin û şewqa wan kêr in, weke heyvê cismên asîman in. Em ji wan tiştên, ku li ezman dibiriqin, re "Stêrk-Stêr" dibêjin. Stêrk jî xwedî şewq û germiyê ne.



Ji vê tebaqa hewayê, ku dinya dor-
pêç kiriye, re "Atmosfer" tê gotin. Stû-
riya (qalind bûna) tebaqa atmosferê li
Ekvadorê zêde û li Qitûban kêr e.
Li gor texmînan stûriya tebaqa At-
mosferê di navbera pêncsed (500) û
neh sed (900) kîlomêtro de ye.

X X X X X X X X X X X

SÎSTEMA RO YÊ



Dinya cismekî me-
zin ji cismên ku,
li dora ro yê difi-
tilin, e. Li dora ro
yê heşt (8) cismên
din jî hene. Ew jî
cismên mezin in.
Ev her neh cism
bi hev re li dora
royê difitilin (ge-
ra xwe dîkin). Ji xeynî van cisman
hin cismên piçûk jî hene û ew jî li
dora royê gera xwe dîkin.


Hin ji wan cismên ku li dora royê
digerin parçê tehtan yê piçûk û bi-
ciqandî ne. Ji wan re "Kevirên ezman"

tê gotin.

Di rojên bê ewr de tiştê ku dibiriqîne û tîrêjan dide "RO" ye. Di havînê de tîrêj û germiya rojê xwêdanê bi meriv dixê. Ro, ronahiyê dide dinê û ew kaniya ronahiyê ye. Şev û roj, ba û bahoz û baran bûyerên, ku bi bandora (tesîra) rojê tîrêjanê, ne.

Çaxa dinya li dora rojê difitile û gera xwe dike, tîrêjên rojê carna ser rast û carna jî bi meyil tîrêjanê. Ev bûyer li dinê cudatiya (cîhêtiya) germî û sariyê tîrêjanê.

Ciyê ku tîrêjên rojê rast bi rast tîrêjanê ser, demsal (mewsîm) havîn e. Ciyê ku tîrêjên rojê pir kêmtîrêjanê ser an jî bi meyil tîrêjanê ser, demsal zivistan e.



RÊWÎTIYA ASÎMAN

Merivan ji berê de asîman meraq kirine. Li gor xwe û li gor hacetên di destan de, asîman veşandine û lê kolane. Xwestine ku girêka sira asîman vekin.




Îro jî ev karê han berdewam e. Ji ber ku merivên îro xwedî hacetên nû û nûjen in, di çûna heyvê de bi ser ketine. Çûne û diçin heyvê.

Ji kesên ku, bi kar û barê heyvê dadikevin, re "Kozmonot" an jî "Astronot" tê gotin. Hacetên nûjen ku, îro di kar û barê asîman de tînin xebitandin "Teleskop" "rakêtên ku meriv dibin heyvê" û her wekî din in.

RUWÊ ERDÊ

Çaxa dinya çê bûye, ruwê dinê bi qaşil-
lekî hişt hatiye girtin. Ev qaşil qede-
rê 120 km stûr e. Ruwê erdê ji teht û
latên sert pêk hatiye. Erd û axa ku, em
li dora xwe dibînin, ji perçebûn û hûr-
bûna wan teht û latan pêk hatiye. Bi
alîkariya tevlêbûna hin madeyên din
ketiye vê rewşa xwe ya îroyîn. Madeyên
ku îro ji binê erdê derdikevin jî ev
teht û lat in û ew gelekî giranbiha ne.



Çaxa em diçin ser ciyekî bilind û li
dora xwe dinerin, em tenê perçakî piçûk
ji dinê dibînin. Hê gelek ciyên din, ku
me ne dîtine, hene. Ciyên ku ji dûr ve
dixuyên û pir bilind in "Çiya" ne.

Ciyên ku ji çıyan nizimtir in û rût in
 "tim"an jî "gir" in. Hin cî hene ji çıyan
 nizimtir in, bê dar û ber in, bê zinar û
 latên mezin in. Ji wan ciyan re "Qelaç"
 tê gotin, Li gor dora xwe ciyên ku nizm
 in, ciyên ku rast û fireh in "Berî" ne,
 Çiyên ku ji alî çem û lehiyan de hatine
 qelaştin, parçekirin û ciyên ku ji çıyan
 nizimtir in û bi berf in "Zozan" in,

Ava ku ji kaniyekê dertê û ji berf
 û baranê pêk tê, ava ku ber bi ciyên
 nizm ve diherike "Çem" e. Ji çemên piçûk
 re jî "Rûbar" tê gotin. Ji ava ku di kor-
 talan de dimîne "Gol" tê gotin. Derya (behr)
 ji golan mezintir in û ava wan şor e.



VOLQAN

Madeyên binê erdê
yên sincirî û germ
bi alîkariya qul û
qelşan dipijiqin
der. Ji vê bûyerê re
"pijqîna volqanan" tê
gotin. Di vê pijqînê
de gelek made derdi-
kevin der. Wek "gaz,



bihara avê, law" û her wekî din. Madeyên
ku derdikevin li dora devê volqanê kom
dibin. Piştî ku derdikevin ser ruwê erdê
ew dicemidin û tîr û hişk dibin. Bi vê
nevê madeyên ku tîr û hişk dibin û li
ser hev kom dibin, dikevin rengê çiyân.
Ji wan re "Çiyayên şewitî" an jî "Çiyayên
agirî" tê gotin.

- - - - -

A V

Çaxa dinya afirî pir sincirî bû. Hilma
ava li dora dinê jî wek wê sincirî bû.
Çaxa sarbûn çê bû, ew hilm bûn dilop û
xwe bera ser ruwê erdê dan. Paşê kortal
û çiyên kûr bi avê hatin dagirtin û
behr, çem, gol, rûbar û ava binê erdê
pêk hat. Îro dinya ji çara sisê $3/4$ bi
avê hatiye dorpêç kirin.

ZERZELE

Madeyên germ yên binê erdê carna nika-
rin derkevin ser ruwê erdê. Di binê erdê
de ev made hevdu dieciqîn û di vê nav-
berê de teht û lat ji ciyên xwe dileqin.

Leqîn û cîhguhertina teht û latan, bi
cîhbûn û xewrbûnên nû bi xwe re tîne. Ji
ber cîhguhertin, xewrbûn û pijiqandina
madeyan, erd diheje. Ji vê bûyerê re
(erdhejîn) tê gotin. Carna erdhejînên
xurt çê dibin. Carna jî erdhejînên piçûk
û bê deng çê dibin.



Çaxa zerzelên mezin çê dibin, gelek zi-
yan digihê me. Li bajar û gundan xanî û
avanî hildiweşin, gelek meriv û heywan
dimirin, gelek ji wan brîndar dibin. Li
welatê me Kurdistanê zerzele pir çê di-
bin. Gelek caran gund û bajar, xanî, avanî
bi ser şêniyan de hildiweşin. Bi sedan
kes di vê malkambaxiyê de telef dibin.
Bi hezaran bê cîh dimînin û perîşan
dibin.



Hejmaran bigîhînin hev



KEÇ Û BAV

Bav dibêje keça xwe ya kezî

-Keça min, ez dixwazim te bidime mêr

Keç dibêje:

-Ez ne li dijî vê yekê me, lê gerek
xort bi dilê min be

Bav lê vedigerîne:

-Tu hê piçûk î, nagihijî giliya, fêm
nakî, kî başe kî ne baş e. Haya te ji
bayê dinê tune ye

Keç dibêje:

-Lê wekî ez piçûk im, bê fêm im, tu
çima dixwazî min bidî mêr?


x x x x x x x x x x x
- - - - -

QIJİKA AQİLMEND


Qijika (teyr, tû, teyrade) belengaz ji
tîbûna dîmir. Li çolê ew rastî kûzekî
avê hat. Lê çi fêde! kûz mezin bû, qiji-
kê nikarî bû ji kûz avê vexwe. Qijikê
rabû bi nikilê xwe hindik hindik kevir
avêtin hundurê kûz. Av jî pêre pêre
bilind bû û dihate ber lêva kûz. Bi vî
awayî qijikê av vexwar, firî û çû

TÊMURÊ XELÎL MÛRADOV

Erîvan /30/5/1985



Herdû wêne ne weke hev in gelo hûn karin kêmasiyên wan bibîn?



DE RABIN

Kuro,kuro,kuranî
Rabû hilda kewkanî
Li nav hewê bir-anî
Çavê dijmin deranî

Kuro,kuro,rojkanî
Hilda şema kevanî
Kalanê zîv deranî
Sîngê ceşada danî

Kuro,Kuro,sîpkanî
Şyar bû hespê erebî
Li Îranê wî danî
Koka dijmin jî anî

Kuro,kuro,sihanî
Rabû tîfing hilanî
Dest ber dijmin dananî
Koka roma reş anî

Kuro ne tuyê reşî
Xortekî zorê geşî
Nava şêr da tu beşî
Syarekî kawî rewşî

Kuro,kuro,remoşî
Tucar millet nefroşî
Dijmin davêjî qunca
Ew tim te têne reca

Kuro,kuro,Zîlanî
Xweyê derbê giranî
Êla Zîlan mezin e
De syara tu lez bîne

Kuro,kuro,Celalî
Wele Rostemê Zal î
Gurza bavêj her alî
Dijmin tu bike xwelî

Kuro,kuro,banokî
Wele timê bi çek î
Nehêvşîne hevekî
Pak bizanbe,ne tekî

Kîjan qebîle bêjim
Derdê wana ez gêj im
Yek ji yekî mêrxastir
Yek ji yekî delaltir

De hevra bibin bira
Gelî Kurda,malava
Terka qebîla bidin
Kurdistanê azakin

Ez heyrana zendê we
Ez heyrana çavê we
Rabin tifaq û yekbin
Erd,yêra xwe azakin

KARLÊNÊ ÇAÇANÎ





Çar lawîran(heywanan)xwe
veşartine wan bibînin û
boyax bikin

DARA HINARÊ

Bihar tê û dixemile
Hinar li ser dixulxule
Aj dide, gul vedide dar
Hinar li wê dikemile





Hinar xweş û bijûndar e
Bi rûkenî li ser dar e
Meyweke pir spehî ye
Kar û fêde tê de pir e

Di biharê de geş dibe
Hinar digihê xweş dibe
Nîşanek ji biharê ye
Meriv bi wê rûgeş dibe


REŞADÎ

18/6/1985





ORGANÊN PÎVANÊ



Tilî, dest, çeng(mil) ling(pê) û çîmên(paq)
meriv gelek caran bi kêrî pîvanê tên. Hinek
dirêjayî bi alîkariya van organan(lebatan)
tên pîvandin.

C O T K A R

Ey cotkarê xwêdan rêjî	Jîn û jiyan te da zimîn
Li ber tavê çerm birijî	Li ser rijand xwêdan û xwîn
Can û rehê zimînê tu	Ey cotkarê welatê min
Bê te zimîn nade xweşî	Axa welat bi te zêrîn

Bi te şîne bi te ava	Silav silav
Pir û gelez timî tijî	sedcar silav
Dûrbûna te ji zimînê	Li te can da
Wek reng serê neda mejî	zimîn ger gav

Silav silav sedcar silav
Li te can da zimîn hergav

x x x x x x x x x

Axê diqelêş ji can û dila
Çandin şînin li herdû mila
Xurtî dide dû xurdiyê
Li ber tavê timî şil e


DURUST

/Sûrî/


Bi dilxweşî diçî axê
Wek perwana diçe gula
Zinar, çiya bi te şox da
Li dehl û devî girtî pela

Silav silav sedcar silav
Li te can da zimîn her gav

Bi te timî serbilind in
Ey cotkarê axa şêrîn
Tim deng didim lawê gund im
Bi deng xurtî didim qîrîn








KÎ MASÎ DIGIRE ?

XAÇEPÎRS



ÇEPERAST:

1-Navê bajarekî Kurdistanê

2-Heywanekî xwarinê (berewaş) ..du tîp

3-Çaxa meriv li tiştêkî dikole (berewaş)

4-Eşîr, qebîle (berewaş)

5-Merivê ne birçî (berewaş)

6-Agir e (berewaş)

7-Zaravayekî Kurdî (berewaş)

8-Kurdîtî

SEREJÊR

1-Mirov,meriv

2-Navê pêxemberekî(berepaş)..çaxa kesek
tişteki dide meriv(berepaş)

3-Hebûn,pere..raket,xwe dirêj kir

4-Navê keç an jinekê...gotinek êşê

5-Nû,ciwan,nûgihayî

6-Kevirê ber serê gora(tirba)

7-Bajarekî Kurdistanê

x x x x x x x x x x x x x x x

Bersiva xaçepirsa hejmara 21 ê

	1	2	3	4	5	6	7
1	Ş	Ê	X	S	E	Î	D
2	A	L	O				Î
3	G		R	Û	M	E	T
4	I		T	R		M	I
5	R			E	M	Î	N
6	T	E	M	B	Û	R	

NAVEROK

RÛPEL

Zarok fêkiyên malane	1
Mijûlî	2
Dinya	3
Hewa	5
Heyv	6
Asîman	7
Sîstema Royê	8
Rêwitiya Asîman	10
Ruwê Erdê	11
Volqan	13
Zerzele	14
Ji Zarokên Dinê	15
Mijûlî	16
Keç û Bav	17
Mijûlî	18
De rabin	19
Mijûlî	20
Dara Hinarê	21
Organên pîvanê	22
Cotkar	23
Xêzik	24
Mijûlî	25
Xaçepirs	26
Naverok	28

www.arsivakurdi.org



YAN

KURDISTAN

YAN NEMAN !

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNÎŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS : 10:- skr

BIHA